# Perwerdeya Islamî

## Seretayî
## 6

2023/2022
1444

**Amadekar:**
Komîteya Perwerdeya Islamî

**Lêveger:**
Komîteya Şopandinê
Komîteya Redekteyê
Komîteya Dîzaynê

**Mafên amadekirin û weşanê ji Saziya Minhacan û Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re parastî ne.**

**Çapa yekem**
**2022 / 2023**
**1444**

# Pêşgotin

Li gorî plana Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyayê û di bin çavdêriya Saziya Minhacan û Kongireya Islama Dîmokratîk de, em pirtûka «Perwerdeya Islamî» ya refa şeşan a qonaxa seretayî pêşkêşî mamoste û xwendekarên xwe dikin. Ev yek di çarçoveya perspektîfên ku baldariyê didin curetiya fêrkirinê û bi şêwazekî perwerdehî û bipêşketî baştirkirina berhemên wê ku dixwazin reftarên erênî û sincî li gel xwendekar xurt bikin, pêk tê. Bi rêya xurtkirina reftarên erênî û sincî, dixwaze wan nirxên perwerdehî weke reftar di jiyana piratîk de, pêk bîne. Her weha dixwaze ew xwendekar hevsengiyekê di navbera berpirsyariyên xwe yên kesayetî û civakî de, pêk bîne. Ji ber vê yekê, me xwest di vê pirtûkê de, ziman zelal be û şêwaz, hûrbîn be.

Ev pirtûk ji pênc beşên ku mijarên wan cihêreng in pêk tê. Mijarên wê di çarçoveya Qurana Pîroz, gotinên Hz. Pêxember, jînenîgariya pêxembertiyê, sinc û peristinê de ne. Ev mijar bi awayekî hevtemamker û lihevhatî, hatine hûnandin. Her weha her beşek, xwedî armancên fêrkirinê ye û di dawiya her beşekê de, tê pêşbînîkirin ku ev armanc ji hêla xwendekar ve, pêk bên.

Waneyên pirtûkê bi şwazekî piratîkî û encamderxistnê, hatine amadekirin. Her weha wane bi wêneyên raveker û bi şêwazê gotûbêjê (mamoste- xwendekar), hatine dewlemendkirin heta ku deriyê afrandinê li ber xwendekaran bê vekirin û ji şêwazên kilasîkî û ezberkirinê, dûr bikevin û di encamê de, xwendekar karîn û hêzên xwe, di pêşketina kesayetên xwe de, berhênan bikin.

Di dawiya her waneyekê de, nirxandinek bi navê «ez têgihiştina xwe taqî bikim» heye. Ev yek derfetê dide xwendekar ku gotûbêjan bi kesên din mîna mamoste, heval û xizmên xwe re, bike.

Ji ber ku naveroka pirtûkê bingehê birêvebirina pêvajoya perwerdehiyê ye, em hêvî ji mamosteyên xwe (kadroyên perwerdeyê) dikin ku naverokê, bi awayekî nimûneyî bi kar bînin û baldar bin ku çarekirina çalakiyan li ser lênûsê be. Her weha em ji sermiyanên xwendekaran ên rêzdar, hêvî dikin ku zarokên xwe bişopînin û reftarên wan ber bi başiyê ve bibin; bi awayekî ku sincên baş û nirxên bilind li ber çavên wan bên dayîn.

## NAVEROK Û BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ


| Qonaxa | Wane | Rûpel | Hejmara parên xwendinê | Meh |
|---|---|---|---|---|
| Qonaxa Yekem | BEŞA YEKEM | 7 | | |
| | BI NAVÊ XWEDAYÊ MEZIN TESBÎHÊ BIKE | 8 | 2 | Rezber |
| | AŞKEREKIRINA DOZÊ | 11 | 1 | Cotmeh |
| | HEVKAR BIN HÛN Ê BI SER BIKEVIN | 15 | 1 | |
| | DESTÛRÊ BIXWAZIN | 18 | 1 | |
| | ROJÎ (MERC Û HÎMÊN WÊ) | 21 | 1 | |
| | BEŞA DUYEM: | 25 | ..... | Mijdar |
| | TINAZIYÊN XWE BI HEV NEKIN | 26 | 2 | |
| | HELWESTA QUREYŞÊ JI DOZÊ | 29 | 1 | |
| | EM DILNIZIM BIN | 32 | 1 | |
| | KESÊ XURT NE DI PEVÇÛNÊ DE DIYAR DIBE | 35 | 1 | Berfanbar |
| | ROJÎ (ŞIKESTIN Û MEKROHIYÊN WÊ) | 37 | 1 | |
| | BEŞA SÊYEM | 41 | .... | |
| | ÇÎROKA XWEDIYÊN BAXÇE | 42 | 2 | |
| | DORPÊÇKIRIN Û DIJMINAHÎ | 46 | 1 | Rêbendan |
| | Nirxandin û Navber | | | |
| | QEDEXEKIRINA GELACÎ Û LIDÛHEVAXAFTINÊ | 48 | 1 | Reşemeh |
| Qonaxa Duyem | JI GIYANÊ XWEDA BÊ HÊVÎ NEBIN | 50 | 1 | |
| | ZEKAT (MERC Û XURDEYÊN WÊ) | 53 | 1 | |
| | BEŞA ÇAREM | 57 | .... | |
| | DI ÇÊTIRÎN DÎMEN DE | 58 | 2 | |
| | KOÇKIRIN BER BI HEBEŞEYÊ VE | 61 | 1 | Adar |
| | DILNERMÎ JI SINCÊN BAŞ E | 64 | 1 | |
| | BI DADMENDIYÊ EM BI PÊŞ DIKEVIN | 67 | 1 | |
| | BEŞA PÊNCEM | 71 | .... | Cotmeh |
| | EZ NÊZÎK IM | 72 | 1 | |
| | BELAVKIRINA DOZÊ | 75 | 1 | |
| | BIRÊVEBIRINA DEMÊ | 78 | 1 | |
| | RÊZGIRTINA NÊRÎNÊN DIN | 81 | 1 | |
| | BI DILSOZIYÊ EM BILIND DIBIN | 83 | 1 | Gulan |
| | Nirxandin û Navber | | | |

# Beşa Yekem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên Sûreta Waqî`eyê bi şêwazekî dirust bixwîne û wateyên peyvên wê, diyar bike.
2. Hin diyardeyên gerdûnî yên ku meznahiya Xweda diyar dikin, nas bike.
3. Ji rêgezên nûn el-sakîna û tenwînê, rêgeza izharê fêr bibe.
4. Di rêya rastiyê de, xweragiriya Hz. Pêxember li hember ziyanê weke nimûne bigre dest.
5. Di jiyana rojane de, reftarê alîkariyê bi awayekî pratîkî, pêk bîne.
6. Di jiyana rojane de, toreya destûrxwestinê, bi awayekî pratîkî pêk bîne.
7. Fêrî mercên rojiyê bibe û hîmên wê bihejmêre.

# BI NAVÊ XWEDAYÊ MEZIN TESBÎHÊ BIKE

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ أَفَرَءَيْتُم مَّا تَحْرُثُونَ ﴿٦٣﴾ ءَأَنتُمْ تَزْرَعُونَهُۥٓ أَمْ نَحْنُ ٱلزَّٰرِعُونَ ﴿٦٤﴾ لَوْ
نَشَآءُ لَجَعَلْنَٰهُ حُطَٰمًا فَظَلْتُمْ تَفَكَّهُونَ ﴿٦٥﴾ إِنَّا لَمُغْرَمُونَ ﴿٦٦﴾ بَلْ نَحْنُ
مَحْرُومُونَ ﴿٦٧﴾ أَفَرَءَيْتُمُ ٱلْمَآءَ ٱلَّذِى تَشْرَبُونَ ﴿٦٨﴾ ءَأَنتُمْ أَنزَلْتُمُوهُ مِنَ ٱلْمُزْنِ أَمْ
نَحْنُ ٱلْمُنزِلُونَ ﴿٦٩﴾ لَوْ نَشَآءُ جَعَلْنَٰهُ أُجَاجًا فَلَوْلَا تَشْكُرُونَ ﴿٧٠﴾ أَفَرَءَيْتُمُ ٱلنَّارَ
ٱلَّتِى تُورُونَ ﴿٧١﴾ ءَأَنتُمْ أَنشَأْتُمْ شَجَرَتَهَآ أَمْ نَحْنُ ٱلْمُنشِـُٔونَ ﴿٧٢﴾ نَحْنُ جَعَلْنَٰهَا
تَذْكِرَةً وَمَتَٰعًا لِّلْمُقْوِينَ ﴿٧٣﴾ فَسَبِّحْ بِٱسْمِ رَبِّكَ ٱلْعَظِيمِ ﴿٧٤﴾ ﴾ الواقعة [74-63]

**Bi awayekî rast bi lêv bikim:**

{أَفَرَءَيْتُم} {حُطَٰمًا} {فَظَلْتُمْ} {تَفَكَّهُونَ} {أُجَاجًا} {لِّلْمُقْوِينَ}

## Çalakî

**a. Peyvan bigihînim hev û wateyên wan nas bikim:**

| |
|---|
| حُطاماً |
| للمقوين |
| تفكهون |
| مغرمون |
| أجاجا |

| |
|---|
| Binkeftî û azarkirî |
| Hişk |
| Gelekî şor |
| Matmayî dimînin |
| Rêwî |

**b. Ji ayeta pîroz dijwateyên peyvên li jêr derînim:**

| | |
|---|---|
| عَذب | .............................. |
| تجحدون | .............................. |
| تُطفؤون | .............................. |

**Bihizirim û encamê jê bigirim**

Xwedayê payebilind, tevahiya gerdûnê afirand û di çêkirina wê de, afrîner bû. Mezinbûna Xweda di afrandina hemû afrîdeyên wî de, xuya dibe û ji diyardeyên gerdûnî yên ku vê mezinbûna wî raber dikin:

**1. Afirandina erd û asîmanan.**

**2. ..............................................**

**3. ..............................................**

**Rast bi lêv bikim û rêgeza tecwîdî, fêr bibim**

يَنْهَوْنَ　　مَّتَٰعًا حَسَنًا　　مِّنْ عِندِهِۦ

**Encamê bigirim:**

Izhar, ji rêgezên nûn el-sakîna û tenwînê ye. Li gorî ziman tê wateya «diyarkirinê» û weke têgeh: Tê wateya deranîna tîpê ji cîderka wê, bêyî tu vinvineke xuya, bê bihîstin.

**Tîpên izharê di destpêka gotinên li jêr de, kom bûne:**

أخي هاك علماً حازه غير خاسر

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| ....... | ....... | ....... | ....... | ....... | أ |

Gava di gotinekê de yan di du gotinan de, nûn el-sakîna yan tenwîn, were û di pey wê re tîpek ji tîpên bûrî bê, izhar pêk tê.

## Çalakî

**Di ristên li jêr de, rêgeza izharê şîrove bikim:**

مِّنۡ عِندِهِۦ:........................................

مَّتَٰعًا حَسَنًا : ..................................

يَنۡهَوۡنَ:..........................................

## Ji waneyê fêr bibim

1. **Di gerdûnê de, diyardeyên karîn û şiyanên Xwedayê mezin, pir in û nayên jimartin.**
2. ...................................................
3. ...................................................

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Di vê gerdûnê de, av xweşiyeke mezin e ku nîşana karîn û hêza Xweda ye. Ez ê nivîseke ku çar xêzan derbas neke, derbarê vê mijarê de, binivîsim.

# 2



## AŞKEREKIRINA DOZÊ

### Bixwînim û bersivê bidim

Hz. Pêxember, peyama xwe bi awayekî veşartî, belav dikir û vê rewşê sê salan berdewam kir. Hz. Pêxember heval, kesên nêzîk û kesên bi wan bawer, vedixwendin doza xwe heta ku fermana Xweda jê re hat û ji Hz. Pêxember hat xwestin ku rabe dozê aşkere bike. Hz. Pêxember, fermana Xweda pejirand û hilkişiya ser Çiyayê Sefayê û doz li qureyşê kir ku bên ser rêya rast û ji wan re nezanî û windabûna wan, diyar kir.

**1. Çima Hz. Pêxember, destpêkê xizmên xwe vexwendin, doza islamê?**

**2. Li gorî her du ayetên li jêr, pêvajoyên dozê diyar bikim:**

| Ayeta pîroz | Pêvajo |
|---|---|
| ﴿ فَٱصۡدَعۡ بِمَا تُؤۡمَرُ وَأَعۡرِضۡ عَنِ ٱلۡمُشۡرِكِينَ ﴾ | ................................ |
| ﴿ وَأَنذِرۡ عَشِيرَتَكَ ٱلۡأَقۡرَبِينَ ﴾ | ................................ |

### Bixwînim û encamê jê bigirim

Gava Hz. Pêxember êla qureyşê kom kir, ji wan re got: «Heke min ji we re bigota ku di çem de, hin siwar hene û dixwazin, êrîşî we bikin, we dê ji min bawer bikira?»
Wan got: «Belê, me dê ji te bawer bikira; me ji bilî rastiyê tiştekî din ji te nedîtiye.»
Hz. Pêxember got: «Ez ji bo we, şanderê Xweda me.»

Hz. Pêxember di doza xwe de, xwe spart sincên herî baş û nirxên bilind ên ku di civakê de, serwer in. Her weha xwe ji tiştên ku bi wan sincan re dijber in, dûr xist, mîna:

**1. Çêkirina hevparan ji Xweda re.**
**2. ..........................**
**3. ..................................**

### Fêr bibim û bersivê bidim

Hz. Pêxember, rastiya doza xwe û pûçbûna tiştên ku qureyşê peristina wan dikir, aşkere kir. Her weha Hz. Pêxember doz li qureyşê kir ku dev ji peristina wan xwedawendan berdin. Serwerên qureyşê li dijî wî derketin û dijminahiya xwe jê re diyar kir, lê ev yek ne bû rêgir ku hin serwerên qureyşê mîna `Umer bin-Elxetab û Hemza bin Ebdulmutelib (apê Hz. Pêxember) derbasî islamê bibin.

- **Di wê pêvajoyê de, girîngiya islambûna hin serwerên qureyşê yên mezin, diyar bikim.**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Pendyariya Xwedayê mezin pêwîst kir ku hemû şander û pêxemberên wî di dozên xwe de, rastî azar û astengiyan bên; Hz. Pêxember jî yek ji wan e. Di Mekayê de, tevî astengiyên ku rastî wan hat, lê ew ji doza xwe venegeriya ji bo ku:

1. **Di piştgiriya ola Xwedayê mezin de, armancên ku tên hêvîkirin, pêk bên.**
2. ..................................................................

## Çalakî

- **Li gorî xalên li jêr, hevrûkirinekê di navbera her du pêvajoyan (razî-aşker) de, çêbikim:**

| Rûyê hevrûkirinê | Razî | Aşkere |
|---|---|---|
| **Hejmar** | Hindik | Pir |
| **Hêz** | ............. | ............. |
| **Dem** | ............. | ............. |

## Ji waneyê fêr bibim

1. **Pabendiya Hz. Pêxember bi fermana Xweda û aşkerekina dozê re, nîşana destepakî û gihandina nameyê ye.**
2. **Tevî rikberiya serwerên qureyşê ji Hz. Pêxember re jî ev yek nebû rêgir ku vîna Hz. Pêxember bişike û di doza xwe de, berdewam neke.**
3. **...........................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Tevî rikberiya qureşê ji Hz. Pêxember re jî ev yek nebû rêgir ku doza xwe berdewam neke. Ev yek nîşana çi ye? Vê yekê bi sê xêzan diyar bikim.

# 3

Sinc

## HEVKAR BIN HÛN Ê BI SER BIKEVIN

### Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى : ﴿ وَتَعَاوَنُواْ عَلَى ٱلْبِرِّ وَٱلتَّقْوَىٰۖ وَلَا تَعَاوَنُواْ عَلَى ٱلْإِثْمِ وَٱلْعُدْوَٰنِ ﴾ المائدة [2]

- **Ayeta pîroz handana me li ser çi dike?**

### Tê bigihêjim û fêr bibim

Alîkarî, tê wateya ku mirov di karên xêrê de, alîkariya hev bikin. Ji bo ku hezkirin, pevgirêdan û dilovanî, çêbibe û belav bibe, Xwedayê payebilind, me vedixwîne vê yekê (alîkariyê).



## Bixwînim û encamê jê bigirim

Hz. Pêxember got: «Kesên bawermend di dilnermî, dilovanî û hestiyariya xwe de, mîna gewdeyekî ne; heke lebatek jê êşiya, lebatên din bi tagirtin û şiyarbûnê, alîkariya wî dikin.»

| Ji nimûneyên alîkariyê |
| --- |
| Alîkariya endamên malbatê ji hev re. |
| ....................................... |
| ....................................... |
| ....................................... |

## Çalakî

- **Di cihên li jêr de, awayê xwe yê alîkariyê diyar bikim:**

  Dibistan: **Di parastina paqijjiya refa xwe de, alîkar bim.**

  Mal: ....................................................................

  Bajar/Gund: .......................................................

## Bixwînim û encamê jê bigirim

Alîkarî di jiyana me de, xwedî girîngiyeke mezin e. Mirov nikare bi tenê bijî; ji bo ku jiyana wî bi awayekî hêsan bimeşe, bi mirovên din re ji bo pêkanîna hin kar û barên xwe, hemahengiyê pêk tîne. **Ji sûdên alîkariyê:**

**1. Hestê lawazbûnê, li gel mirovan têk dibe.**

**2. ........................................................................**

**3. .......................................................................**

## Çalakî

- **Di derbarê helwestên li jêr de, nêrîna xwe bidim.**

| Helwest | Dipejirînim/ Napejirînim | Sedem |
|---|---|---|
| **Ji bo rakirina kevir ji ser rê, Dilyar, alîkariya hevalê xwe kir.** | Dipejirînim | Ji ber ku hebûna kevir li ser rê, ziyanê dide mirovan. |
| **Ji bo gelaş di nava çem de, bê avêtin Şêrînê, alîkariya hevala xwe kir.** | .............. | .............. |
| **Di kampaniya çandina daran de, grûpeke ciwan, beşdar bûn.** | .............. | .............. |

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Bi kesên din re di kirina xêrê de, alîkar bim.**
**2. ..................................................**
**3. ..................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Bi hevalên xwe re, di derbarê helwesteke ku min tê de alîkariya kesekî kiriye, gotûbêjê bikim û di lênûsa xwe de binivîsim.

4

Sinc

# DESTÛRÊ BIXWAZIN

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ يَٰٓأَيُّهَا ٱلَّذِينَ ءَامَنُواْ لَا تَدۡخُلُواْ بُيُوتًا غَيۡرَ بُيُوتِكُمۡ حَتَّىٰ تَسۡتَأۡنِسُواْ
وَتُسَلِّمُواْ عَلَىٰٓ أَهۡلِهَاۚ ذَٰلِكُمۡ خَيۡرٞ لَّكُمۡ لَعَلَّكُمۡ تَذَكَّرُونَ ٢٧ فَإِن لَّمۡ تَجِدُواْ فِيهَآ أَحَدٗا
فَلَا تَدۡخُلُوهَا حَتَّىٰ يُؤۡذَنَ لَكُمۡۖ وَإِن قِيلَ لَكُمُ ٱرۡجِعُواْ فَٱرۡجِعُواْۖ هُوَ أَزۡكَىٰ لَكُمۡۚ
وَٱللَّهُ بِمَا تَعۡمَلُونَ عَلِيمٞ ٢٨ ﴾ النور [27 - 28]

- **Bixwînim û bersivê bidim:**

## Tê bigihêjim û fêr bibim

Destûrxwestin, toreyeke civakî, reftarekî bilind ê şaristaniyê û sincekî pîroz e ku nîşana perwerdeya çak a mirov raber dike.



## Bixwînim û encamê jê bigirim

Hz. Pêxember (Xweda jê razî be) got: «Heke mirovekî ji we sê caran li ser hev destûr xwest û destûra derbasbûnê nehat dayîn, bila vegere.»

**Ji nimûneyên destûrxwestinê:**

**1. Beriya derbasbûna refê, ez ê destûrê bixwazim.**

**2. ............................................**

**3. ............................................**

## Çalakî

**Di helwestên li jêr de, reftarê xwe diyar bikim:**

1. Min li deriyê mala hevalê xwe da; deriyê wan vekirî bû û kesî destûra derbasbûnê neda min.

   ....................................................

2. Min destûra derbasûnê xwest û ji min re hat gotin, vegere:
   **Min ev yek bi derûniyeke xweş, pejirand.**
3. Min li deriyê malê xist û ji min hat pirsîn, kî li derî dide?

   ....................................................

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Destûrxwestin ji rêgezên sincî ye ku ola islamê handana me li ser wê kiriye. Ji ber encamên wê yên erênî, ew ji tiştên giştî ye ku pêwîstiya mirov di danûstandinan de, bi wê heye:

**1. Aramî û vehesînê tîne.**

**2. ...........................**

**3. ...........................**

## Çalakî

- **Di derbarê helwestên li jêr de, nêrîna xwe bidim**

| Helwest | Dipejirînim/ Napejirînim | Sedem |
|---|---|---|
| Hevend, pênûsa hevalê xwe bêyî destûra wî, bi kar anî. | .............. | .............. |
| Kajînê, li deriyê odeya dê û bavê xwe xist û wan destûr dayê û ew derbas bû. | Dipejirînim | .............. |
| Ciwan, beriya ku destûr bê dayîn, bersiva pirsa mamosteya xwe da. | .............. | .............. |

## Ji waneyê fêr bibim

1. Beriya derbasbûna malan, ez ê destûrê bixwazim.
2. ..........................................................
3. ..........................................................

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Sê cihên ku di dema derbasbûna wan de, destûr tê xwestin û sê cihên ku di dema derbasbûna wan de, destûr nayê xwestin, bi bîr bînim û wan di lênûsa xwe de, binivîsim.

# 5

# ROJÎ (MERC Û HÎMÊN WÊ)

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿فَمَن شَهِدَ مِنكُمُ ٱلشَّهۡرَ فَلۡيَصُمۡهُ﴾ البقرة [185]

- **Wateya ayeta pîroz diyar bikim.**

## Çalakî

Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: «Bi dîtina wê (heyvê) rojî bigirin û bi dîtina wê (heyvê) bifitirin; heke ewr be; hejmara sihî temam bikin.»

**Em hatina meha rojiyê bi rêya dîtina ........................ tekez dikin.**

## Fêr bibim û bersivê bidim

- **Mercên ku rojiyê dikin erk:**

  Ew mercên sereke ne ku peristin bêyî wan nabe:

| | | |
|---|---|---|
| **Islam** | → | Li ser her misilmanî ferz e. |
| **Gihiştîbûn** | → | .................................. |
| .......... | → | Li ser kesê dîn, ne erk e. |
| **Karîn** | → | Li ser kesên nexweş û xwedîtemen, ne erk e. |
| **Niştecihbûn** | → | Li ser kesê rêwî, ne erk e. |

**Hîmên Rojiyê:**

Ew kiryarên ku heke dabîn nebin, bêyî wan hebûna rojîyê dirust nabe:

**a. Niyaz:** Cihê wê dil e û bi niyazê peristin ji bilî xwe cuda dibe. Dibe ku mirov bi sedema mijûlbûna bi kar û ji ber sedemên tendirustî, xwe ji xwarin û vexwarinê qut bike.

**b. Xwequtkirina ji tiştên ku mirov ji rojî dixin:**

.............................................................................................

**Bixwînim û encamê jê bigirim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَمَن كَانَ مَرِيضًا أَوْ عَلَىٰ سَفَرٍ فَعِدَّةٌ مِّنْ أَيَّامٍ أُخَرَ ۗ يُرِيدُ ٱللَّهُ بِكُمُ ٱلْيُسْرَ وَلَا يُرِيدُ بِكُمُ ٱلْعُسْرَ﴾ البقرة [185]

**Di hin rewşan de, çêdibe ku mirov rojiyê negire û ji wan rewşan:**

1. Nexweşî
2. ………...
3. ………...

**Di rewşên bûrî (li jor) de, Xweda destûra nerojîgirtinê daye me ji ber ku**

.............................................................................

.............................................................................

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Di meha remezanê de, merc û hîmên rojiyê li ber çavan derbas bikim.**

**2. ...........................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Meha rojiyê, meha kar û peristinê ye; ne ji bo tiraliyê ye. Di derbarê vê mijarê de, ez ê çar xêzan binivîsim.

# Beşa Duyem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên Sûreta Hucuratê bi awayekî rast bixwîne û wateyên peyvên wê, diyar bike.
2. Li ser bingeha rêgezên mirovahî, rêzê ji mirovan re bigire.
3. Ji rêgezên nûn el-sakina û tenwînê, rêgeza iqlabê nas bike.
4. Her gav doza sincên herî baş bike û li hember astengiyan bê çare nebe.
5. Wateya dilnizmiyê nas bike û wê di jiyana xwe ya rojane de, pêk bîne.
6. Bibe xwedî vîneke pir xurt û dûrî hêrsbûnê bikeve.
7. Fêrî toreyên rojiyê bibe û dûrî mekrohiyên wê bikeve.

# 1



## TINAZIYÊN XWE BI HEV NEKIN

### Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿يَٰٓأَيُّهَا ٱلَّذِينَ ءَامَنُواْ لَا يَسۡخَرۡ قَوۡمٞ مِّن قَوۡمٍ عَسَىٰٓ أَن يَكُونُواْ خَيۡرٗا مِّنۡهُمۡ وَلَا
نِسَآءٞ مِّن نِّسَآءٍ عَسَىٰٓ أَن يَكُنَّ خَيۡرٗا مِّنۡهُنَّۖ وَلَا تَلۡمِزُوٓاْ أَنفُسَكُمۡ وَلَا تَنَابَزُواْ بِٱلۡأَلۡقَٰبِۖ بِئۡسَ
ٱلِٱسۡمُ ٱلۡفُسُوقُ بَعۡدَ ٱلۡإِيمَٰنِۚ وَمَن لَّمۡ يَتُبۡ فَأُوْلَٰٓئِكَ هُمُ ٱلظَّٰلِمُونَ ١١﴾ الحجرات [11]

**Gotinên li jêr rast bi lêv bikim:**

{تَلۡمِزُوٓاْ} {تَنَابَزُواْ} {بِٱلۡأَلۡقَٰبِ} {ٱلۡفُسُوقُ}

### Çalakî

**a. Peyvan bigihînim hev û wateyên wan nas bikim:**

| | |
|---|---|
| يسخر | Navlihevkirin |
| تلمزوا | Hokarê nebaş |
| تنابزوا | Tinazîkirin û hevkêmxistin |
| الفسوق | Kêmkirin |

**b. Ji ayeta bûrî, dijwateyên peyvên li jêr derînim:**

| | |
|---|---|
| يحترم | ............. |
| عَادِل | ............. |
| نِعمَ | ............. |

### Bixwînim û encamê jê bigirim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ وَمِنْ ءَايَٰتِهِۦ خَلْقُ ٱلسَّمَٰوَٰتِ وَٱلْأَرْضِ وَٱخْتِلَٰفُ أَلْسِنَتِكُمْ
وَأَلْوَٰنِكُمْ ۚ إِنَّ فِى ذَٰلِكَ لَءَايَٰتٍ لِّلْعَٰلِمِينَ ﴿٢٢﴾ ﴾ الروم [22]

**Pendyariya Xweda, pêwîst kiriye ku mirov ji hêla dirûv û karînên xwe ve, bê ku wan di ser hev re bigire, cuda bin û ev yek jî ji bo ku:**

**1. Hev û du temam bikin û hev û du kêm nekin**

**2. ...................................................**

### Bihizirim û encamê jê bigirim

**Xwedayê payebilind, dozê li me dike ku em nirx bidin xwe û kesên dîtir; em hemû mirov in û mirovahî me digihîne hev:**

**1. Em tinaziyên xwe bi kesên din nekin, dibe ku ew ji me qenctir bin.**

**2. ..............................................................**

**3. ..............................................................**

**Rast bi lêv bikim û fêrî rêgeza tecwîdî, bibim:**

﴿ سَمِيعًا بَصِيرًا ﴾ ﴿ مِنْ بَعْدِ ﴾

**Encamê bigirim:**

Ji rêgezên nûn el- sakina û tenwînê rêgeza iqlabê heye. Li gorî ziman, iqlab tê wateya «tiştek ji rûyê xwe bê zîvirandin.»
Iqlab weke têgih: Tê wateya gava nûn el-sakîna û tenwîn, berî tîpa «b»yê bên ew her du (nûn el-sakîna û tenwîn) dibin tîpa «m»yê û ew xunxun dimîne.
Ji iqlabê re tîpek tenê heye ew jî tîpa «b»yê ye.

**Di rista quranî ya li jêr de, rêgeza iqlabê şîrove bikim:**

﴿ مِنْ بَعْدِ ﴾:**Me beriya tîpa «b»yê nûn el-sakîna zîvirand tîpa «m»yê û weha tê bilêvkirin (مم بعد)**

﴿ سَمِيعًا بَصِيرًا ﴾:..............................................................

## Ji waneyê fêr bibim

1. **Bi navên ku mirov ji wan tengezar dibin, bang li wan nekim.**
2. .............................................................................

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Xweda teşe û rengên me ji hev cuda afirandine. Her weha Xweda her mirov, xwedî taybetiyên cuda afirandiye. Tiştê hevpar ê ku me tevan cihwaz dike, hişê me ye. Derbarê vê mijarê de, nivîseke ku ji çar xêzan pêk tê, binivîsim.

# HELWESTA QUREYŞÊ JI DOZÊ

## Bixwînim û bersivê bidim

Piştî ku Hz. Pêxember doza xwe berdewam kir, serwerên qureyşê, berên xwe dan apê Hz. Pêxember; Ebî Talib. Di nava gelê xwe de Ebî Talib, xwedî rûmet û cihekî berz bû. Her weha li gel Hz. Pêxember xwedî cihekî taybet bû. Wan xwest ku Ebî Talib, Hz. Pêxember bigihîne wê yekê ku dev ji doza xwe berde, bi mercê ku wî li qureyşê bikin şah an malê ku ew dixwaze bidin wî.

**1. Sedema ku hişt Hz. Pêxember dozê aşkere bike, bi bîr bînim.**

**2. Sedem ku hişt serwerên qureyşê, ji apê Hz. Pêxember bixwazin ku Hz. Pêxember dev ji dozê berde, çi bû?**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Gava Ebî Talib ji Hz. Pêxember re, dabaşa tiştên ku serwerên qureşê gotine û pêşkêş kirine kir, Hz. Pêxember bersiv wiha da: «Apo! Bi Xweda, heke Rokê têxin destê min ê rastê û Heyvê têxin destê min ê çepê, ez dev ji vê dozê bernadim; heta ku Xweda wê diyar bike yan ez di vê rêyê de, têk biçim.»

**Ji rêgezên Hz. Pêxember:**

**1. Di rêya rastiyê de, xwecih bû.**

**2. ..................................**

**3. ..................................**

## Fêr bibim û bersivê bidim

Hemû serwerên qureyşê, li hember Hz. Pêxember derdiketin û di bêhtirî cihekî de wan zirar digihandin wî û bi hemû cureyên zirarê li hember wî derdiketin, lê tevî vê yekê Hz. Pêxember, ev yek bi qencî pêşwazî dikir û wiha digot: «Xwedayê min! Wan bibexşîne ew nizanin.»

**Ji şêweyên ku qureyşê pê ziyan digihandin Hz. Pêxember:**

**1. Ew bi dînîtiyê tewanbar dikir.**

**2. ..................................**

**3. ..................................**

## Çalakî

Ji ber ku Hz. Pêxember, rêya rast nas dikir û nirxê xwecihiya li ser dizanî, li hember hemû cureyên azaran ên ku gelê wî bi serê wî de tanîn, xwe ragirt.

**Ji encamê xwecihiya li ser rastiyê:**

**1. Xwegihandina armancan.**

**2. ...............................**

**3. ...............................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Xwecihî û vîn, ji taybetiyên pêxemberan in.**

**2. ......................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Ji bo em xwe bigihînin serkeftinê, vîn û hedan, pêwîst in. Derbarê vê yekê de, mijarekê ji afrîneriya xwe ava bikim û wê bi nivîseke ku ne zêdeyî sê xêzan be, binivîsim.

# 3

## EM DILNIZIM BIN

### Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَىٰ: ﴿ وَعِبَادُ ٱلرَّحۡمَٰنِ ٱلَّذِينَ يَمۡشُونَ عَلَى ٱلۡأَرۡضِ هَوۡنٗا وَإِذَا خَاطَبَهُمُ
ٱلۡجَٰهِلُونَ قَالُواْ سَلَٰمٗا ٦٣ ﴾ الفرقان [63]

- **Taybetiya pesindayîya ku Xwedayê payebilind peristkerên xwe pê nimandiye çi ye?**

### Tê bigihêjim û fêr bibim

Dilnizmî, taybetiyeke pesindayî ye. Dilnizmî di danûstandinê de wekheviyê pêk tîne û me dûrî xwemezinkirin û pozbilindiyê, dixe. Divê em xwe di hemû tiştan de, ji mirovên dîtir qenctir nebînin û her gav aram, hevseng û hêmin bin.



## Bixwînim û encamê jê bigirim

Hz. Pêxember doza dilnizmiyê dikir û di gotinên xwe de handana vê yekê dikir û digot: «Xweda sirûş daye min ku dilnizm bin da ku sitemkariyê li hev nekin û xwe li ser serê hev mezin nekin.»

| Ji mînakên dilnizmiyê |
|---|
| Rêzgirtina ji mamoste re |
| .............. |
| .............. |

## Çalakî

- **Di derbarê helwestên li jêr de, ez ê nêrîna xwe bidim:**

| Helwest | Dipejirînim/ Napejirînim | Sedem |
|---|---|---|
| **Aram li ber dilê mirovan dide û qenciyê bi wan dike.** | .............. | .............. |
| **Ji ber ku hevala Bêrîvanê, bersiv şaş da, wê tinaziyên xwe pê kir.** | .............. | .............. |
| **Diyar ji hevalê xwe xwest ku ji bilî wî hevaltiya kesekî din neke.** | Napejirînim | Ezezîtî, taybetiyeke nebaş e. |

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Dilnizmî taybetiyek e di navbera mirovan de, hezkirin û pevgirêdanê xurt dike. Her weha ji bo civak û mirovan gelek say û berhemên wê hene:

**1. Derûniyê ji kêmaniyan dûr dixe.**

**2. ....................................**

**3. ....................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Xwe di ser kesekî re nabînim.**

**2. ....................................**

**3. ....................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Hz. Pêxember dibêje: «Xweda bi bexşandinê, mirov dike xwedî şkodarî û kesê ku xwe ji Xweda re dilnizm dike, Xweda wî bilind dike.»

**Ji gotinên Hz. Pêxember, ez ê reftarên ku em dikarin sûdê jê bigirin, binivîsim.**

# 4
## KESÊ XURT NE DI PEVÇÛNÊ DE DIYAR DIBE

### Bixwînim û bersivê bidim

Ebû Hûreyra (Xweda jê razî be) got: Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) got: «Kesê xurt ne di pevçûnê de diyar dibe; xurtî ew e ku mirov xwe di dema hêrsbûnê de, bigire.»
(Buxarî û Muslim)

**Mebest ji hêza mirov, ne hêza gewdeyî tenê ye; lê kesê bawermend ew kesê xwedî:**

**1. Vîna xurt.**
**2. ..................**
**3. ..................**

### Tê bigihêjim û fêr bibim

Xweragirî: Tê wateya ku mirov di hemû bûyerên ku rastî wan tê, hêrsbûna xwe kontirol bike û xwedî aramî û hedan be.

### Çalakî

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَٱلۡكَٰظِمِينَ ٱلۡغَيۡظَ وَٱلۡعَافِينَ عَنِ ٱلنَّاسِۗ وَٱللَّهُ يُحِبُّ ٱلۡمُحۡسِنِينَ﴾ آل عمران [134]

**Helwestên li jêr sererast bikim:**

- Elî li qada dibistanê baz dida û li hevalê xwe likumî. Elî bi dengekî bilind ji hevalê xwe re got: «Ma tu ber xwe nabînî?»

  ..............................................................

- Ji ber ku bavê Nisrînê jê re got: «Çima tu neçûyî dibistanê?» Ew ji bavê xwe tengezar bûye.

  ..............................................................

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Ji rêbazên herî girîng ên ku mirov dûrî hêrsbûnê dixin û nahêlin ku mirov di tolhildan û vegerandina nemerdiyê de bihizre, bexşandin e. Kesê pendyar û xwedî sincê bilind, ew kesê ku dev ji helwestên neyînî berdide û dihêle ku derbas bibin û tu baldariyekê nade wan.

**Hin berhemên bexşandinê yên ku sûdê didin civakê:**

**1. Di navbera endamên wê de, hevgirtinê xurt dike.**

**2.** .........................................................

**3.** .........................................................

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Di helwestên zehmet de, xwe bigirim.**

**2.** .........................................................

**3.** .........................................................

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Bi malbata xwe re, di derbarê hêrsbûn û encamên wê li ser kes û civakê de, gotûbêj bikim û di lênûsa xwe de, bi nivîseke ku ne zêdeyî sê xêzan be, binivîsim.

# 5

# ROJÎ (ŞIKESTIN Û MEKROHIYÊN WÊ)

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿أَيَّامًا مَّعْدُودَاتٍ ۚ فَمَن كَانَ مِنكُم مَّرِيضًا أَوْ عَلَىٰ سَفَرٍ فَعِدَّةٌ
مِّنْ أَيَّامٍ أُخَرَ ۚ وَعَلَى الَّذِينَ يُطِيقُونَهُ فِدْيَةٌ طَعَامُ مِسْكِينٍ ۖ فَمَن تَطَوَّعَ خَيْرًا فَهُوَ
خَيْرٌ لَّهُ ۚ وَأَن تَصُومُوا خَيْرٌ لَّكُمْ ۖ إِن كُنتُمْ تَعْلَمُونَ ﴿١٨٤﴾﴾ البقرة [184]

- **Li gorî ayeta pîroz wateya rista quranî ya li jêr çi ye?**

  فعدة من أيام اخر

## Çalakî

Ji her peristinekê re, hin tore hene. Rojî jî peristinek e û hin toreyên wê hene ku divê li gel kesê misilman peyda bin:

**1. Kirina xêran.**

**2. Derengxistana paşîvê (sihûrê).**

**3. ………………**

**4. ………………**

## Bixwînim û bersivê bidim

Hz. Pêxember got: «Kesê ku di rojiyê de, xwar û vexwar û ji bîr kir ku ew bi rojî ye, bila rojiya xwe berdewam bike; Xweda ew bi xwarin û av kir.»

**Ji gotina Hz. Pêxember tê xuyakirin ku şikestinên rojiyê:**

..................................................................................

## Çalakî

- **Di derbarê helwestên li jêr de, ez ê nêrîna xwe bidim:**

| Kiryar | Rojiyê dişkîne | Rojiyê naşkîne |
|---|---|---|
| Mirov, di rojiyê de bi mebest bixwe û vexwe. | √ | |
| Di rojiyê de, bê mebest, bixwe û vexwe | | |
| Bi mebest xwe verşîne. | | |
| Bê mebest verşiya. | | |

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Hz. Pêxember got: «Kesê ku dev ji gotin û karê sexte bernede, pêwîstiya Xweda bi wê yekê tune ye ku ew kes, dev ji xwarin û vexwarina xwe berde.»

**Ji mekrohiyên rojiyê:**

**1. Derew û gelacî.**

**2. ..................**

**3. ..................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Xwe dûrî kiryarên nebaş bixim û toreyên rojiyê, di kesayeta xwe de pêk bînim.**

**2. .......................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Bi hevalên xwe re, di derbarê, toreyên herî girîng ên ku divê kesê rojîgir di kesayeta xwe pêk bîne, gotûbêj bikim û li lênûsa xwe binivîsim.

# Beşa Sêyem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên pîroz ên Sûreta Qelemê bi awayekî rast bixwîne û wateyên peyvên wê diyar bike.
2. Li ser xweşiyên Xweda yên pir, spasiya wî bike.
3. Ji rêgezên nûn el-sakîna û tenwînê, rêgeza idxamê, nas bike.
4. Rola Benî Haşim di parastina Hz. Pêxember de, nas bike.
5. Di jiyana xwe ya rojane de, ji gelacî û axaftina li paş hev, dûr bikeve.
6. Geşbîniyê rabhîze û dûrî reşbîniyê bikeve.
7. Mercên zekatê û kesên ku xurdeyên wê ne, nas bike.

# 1

## ÇÎROKA XWEDIYÊN BAXÇE

### Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى : ﴿ إِنَّا بَلَوْنَٰهُمْ كَمَا بَلَوْنَآ أَصْحَٰبَ ٱلْجَنَّةِ إِذْ أَقْسَمُوا۟ لَيَصْرِمُنَّهَا مُصْبِحِينَ (١٧) وَلَا يَسْتَثْنُونَ (١٨) فَطَافَ
عَلَيْهَا طَآئِفٌ مِّن رَّبِّكَ وَهُمْ نَآئِمُونَ (١٩) فَأَصْبَحَتْ كَٱلصَّرِيمِ (٢٠) فَتَنَادَوْا۟ مُصْبِحِينَ (٢١) أَنِ ٱغْدُوا۟ عَلَىٰ
حَرْثِكُمْ إِن كُنتُمْ صَٰرِمِينَ (٢٢) فَٱنطَلَقُوا۟ وَهُمْ يَتَخَٰفَتُونَ (٢٣) أَن لَّا يَدْخُلَنَّهَا ٱلْيَوْمَ عَلَيْكُم مِّسْكِينٌ
(٢٤) وَغَدَوْا۟ عَلَىٰ حَرْدٍ قَٰدِرِينَ (٢٥) فَلَمَّا رَأَوْهَا قَالُوٓا۟ إِنَّا لَضَآلُّونَ (٢٦) بَلْ نَحْنُ مَحْرُومُونَ (٢٧) قَالَ أَوْسَطُهُمْ
أَلَمْ أَقُل لَّكُمْ لَوْلَا تُسَبِّحُونَ (٢٨) قَالُوا۟ سُبْحَٰنَ رَبِّنَآ إِنَّا كُنَّا ظَٰلِمِينَ (٢٩) فَأَقْبَلَ بَعْضُهُمْ عَلَىٰ بَعْضٍ يَتَلَٰوَمُونَ (٣٠)
قَالُوا۟ يَٰوَيْلَنَآ إِنَّا كُنَّا طَٰغِينَ (٣١) عَسَىٰ رَبُّنَآ أَن يُبْدِلَنَا خَيْرًا مِّنْهَآ إِنَّآ إِلَىٰ رَبِّنَا رَٰغِبُونَ (٣٢) ﴾ القلم [32-17]

**Gotinên li jêr rast bi lêv bikim:**

{لَيَصْرِمُنَّهَا} - {يَسْتَثْنُونَ} - {كَٱلصَّرِيمِ} - {يَتَخَٰفَتُونَ} - {قَٰدِرِينَ} - {يَتَلَٰوَمُونَ}

### Çalakî

**a. Peyvan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:**

| |
|---|
| بلوناهم |
| ليصرمنها |
| كالصريم |
| فتنادوا |
| اغدوا |
| يتخافتون |

| |
|---|
| Şeva tarî |
| Zû biçin |
| Me ew ezmûn kirin. |
| Bi dengekî nizim diaxivin. |
| Berhemên baxçeyê xwe diçinin. |
| Bang li hev kir. |

**b. Bixwînim û lihevhatinê pêk bînim:**

| Raman | | Rista quranî | |
|---|---|---|---|
| Derbasbûna baxçe li kesên xizan hat qedexekirin. | 4 | وَلَا يَسۡتَثۡنُونَ | 1 |
| Wan niyaz nekir ku parekî ji kesên xizan re, bihêlin. | ... | أَنِ ٱغۡدُواْ عَلَىٰ حَرۡثِكُمۡ إِن كُنتُمۡ صَٰرِمِينَ | 2 |
| Çûn û li ser qutkirina berhemên wê rijd bûn. | ... | وَغَدَوۡاْ عَلَىٰ حَرۡدٖ قَٰدِرِينَ | 3 |
| Li ser bêparbûna kesên xizan ji berheman, rijd bûn. | ... | أَن لَّا يَدۡخُلَنَّهَا ٱلۡيَوۡمَ عَلَيۡكُم مِّسۡكِينٞ | 4 |

**c. Ji ayeta pîroz a bûrî, dijwateyên peyvên li jêr derînim:**

| Peyv | يصرخون | عادلون | مستيقظون | مُمسون |
|---|---|---|---|---|
| Dijwate | .......... | .......... | .......... | .......... |

**Bihizirim û encamê jê bigirim**

Tiştê herî qenc ê ku mirov dikare bike, ew e ku spasiya Xweda li ser xweşiyên pir ên dane wî, bike. Tiştê herî kêm ê ku mirov dikare bike; parekî ji wan xweşiyan (malê xwe), destnîşan bike, veqetîne û weke sedeqe bide kesê xizan û xwedî pêwîstî.

**Ji ber ku sedeqe:**

1. **Ji qenctirîn tiştên ku mirov dikare bi wan xwe nêzîkî Xweda bike.**
2. ........................................................................................
3. ........................................................................................

Rast bi lêv bikim û fêrî rêgeza tecwîdî, bibim:

﴿ مِن وَلِيّٖ ﴾ ﴿قَوۡمٖ يُؤۡمِنُونَ﴾ ﴿مِن رَّبِّكَ﴾ ﴿ سَآئِغٗا لِّلشَّٰرِبِينَ ﴾

**Encamê bigirim:**

Rêgeza idxamê: Rêgezeke ji rêgezên nûn el-sakîna û tenwînê ye.

Di ziman de: Tê wateya derbasbûna tiştekî di tiştekî din de.

Idxam weke têgeh: Ew e ku dengdar (sakin) û dengdêr (muteherik) li rex hev bên û ew her du deng weke tîpeke lerzok ji cureyê duyem bên xuyakirin.

Idxam dibin du cure:

**1. Idxama kêm**

**2. Idxama sergihayî**

- Idxama kêm: Gava piştî nûn el-sakîna yan tenwînê, tîpeke ji tîpên gotina **(يومن)** bê, ev idxam pêk tê. Tîpên «idxama kêm» di gotina, **(يومن)** de civiyane.
  **Mînak: من ولي:** Li gel tîpa **(و)** yê me nûn el-sakîna idxam kir û wiha tê bilêvkirin: **(مِوَّلِي).**
- Idxama sergihayî: Gava piştî nûn el-sakîna û tenwînê tîpên **(ل - ر)** bên, ev dîxam pêk tê.
  **Mînak: منْ ربك:** Li gel tîpa **(ر)** yê me nûn el-sakîna idxam kir û wiha tê bilêvkirin: **(مِرَّبك).**

**Di rista quranî ya li jêr de, rêgeza tcwîdî, şîrove bikim:**

﴿قَوۡمٖ يُؤۡمِنُونَ﴾ :.....................................................................................

﴿ سَآئِغٗا لِّلشَّٰرِبِينَ ﴾ :...............................................................................

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Xweşiyên ku Xwedayê payebilind dane min, ez ê bi kesên din re, parve bikim.**

**2. ……………………………………......................**

**3. ……………………………………......................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Dema ku em pêdanê (mukirhatinê) bi şaştiyên xwe bikin û di wan şaştiyan de, rijdbûnê nekin, ev yek derfetê dide ku em di jiyanê de serkeftî bin. Di derbarê vê mijarê de, ez ê sê xêzan binivîsim.

# DORPÊÇKIRIN Û DIJMINAHÎ

## Bixwînim û bersivê bidim

Di destpêka sala heftem a şandeyê de û piştî têkçûna hemû hewldanên bûrî, qureyşê şêwazekî nû bi Benî Haşim û Benî Ebd El-Mutelib (ên ku parastina Hz. Pêxember dikirin) re, bi kar anî û ew jî birrîna têkiliyên giştî bû. Biryara birrîna têkiliyên civakî û darayî, hat standin û li hêla din û beranberî vê biryara sitemkar, Ebû Talib doza parastina Hz. Pêxember û xizmên wî kir.

- **Sedema ku qureyşê şêwazekî nû li hember Hz. Pêxember û xizmên wî bi kar anî, diyar bikim.**
- **Qureyşê di cenga li hember doza Hz. Pêxember de, çi şêwazê nû bi kar anî?**

## Bixwînim û encamê jê bigirim

Serwerên qureyşê li ser çend xalan li hev kir û ew xal kirin belge û têkiliyên xwe bi rêya wê belgeyê ji Hz. Pêxember û gelên wî birrîn. Naveroka vê belgeyê wiha bû: «Bi navê te ey Xweda! Ev peymaneke di navbera êlên qureyşê de ye; ne ji wan bizewicin û ne jî bidin wan, ne ji wan bikirin û ne jî bifroşin wan, ne bi wan re rûnên û ne têkelî wan bibin, ne derbasî malên wan bibin û ne bi wan re biaxivin, tu carî aşîtiyê ji hêla wan nepejirînin û dilovaniyê raberî wan nekin, heta ku Hz. Mihemed, radest nekin.»

- **Ji bendên civakî**

  1............... 2............... 3...............
- **Ji bendên aboriyî**

  1............... 2............... 3...............

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Piştî sê salan ji wê belgeya têkilîbirrînê Hz. Pêxember û kesên pê re, gelek azar kêşan û li ser wê yekê hedan kir; heta ku ji birçîna pelên daran jî xwarin. Piştî wê yekê, hin serwerên qureyşê dît ku wan têkiliyên xwe bi xizmên xwe re birrîne û bi awayekî sivik li rastiyê nêriye, lewra li hev civiyan û biryar da ku destên xwe ji wê belgeya sitemker, bikişînin û dorpêçkirinê bi dawî bikin, da ku:

**1. Di Cizîra Erebî de, cihê xwe yê olî biparêzin.**
**2. ..................................................................**
**3. ..................................................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Dema ku mirov li ser rêya rast be, zehmetî û westan, hêsan dibin.**
**2. ..........................................................**
**3. ..........................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Apê Hz. Pêxember Ebû Talib got: «Biçe biraziyê min! Tu çi dixwazî bibêjî, bibêje; bi Xweda ez te radestî tu tiştî nakim.»
Bi malbata xwe re, derbarê mijara **«di dema astengiyan de, rola malbatê di pişgirtiya endamê xwe de»**, gotûbêj bikim û di lênûsa xwe de, binivîsim.

# 3

## QEDEXEKIRINA GELACÎ Û LIDÛHEVAXAFTINÊ

### Bixwînim û bersivê bidim

Hz. Pêxember got: Hûn dizanin lidûhevaxftin çi ye?
Got: Xweda û şanderê wî dizanin.
Hz. Pêxember got: Ku tu tiştekî li dû birayê xwe bibêjî ku ew ji wî tiştî tengezar dibe.
Got: Heke ew taybetî tê de, hebe?
Hz. Pêxember got: Heke ew taybetî tê de hebe, tu li dû wî axivî û heke tê de tune be, te bêbextî lê kir.

- **Li gorî gotina Hz. Pêxember, cudahiya di navbera lidûhevaxaftin û bêbextiyê de, diyar bikim.**

### Tê bigihêjim û fêr bibim

Lidûhevaxaftin: Di dema neamadebûna mirov de, kêmasiyên ku di mirov de hene û ew ji wan tengezar dibe, bi rêya gotin, nîşand û lasakirinê, bên vegotin û kirin.

Gelacî: Di navbera mirovan de, bi mebesta gihandina ziyanê û xerakirin têkiliyan, veguhestina gotinan e; çi ev gotin derew bin an rast bin.

### Bixwînim û encamê jê bigirim

قَالَ تَعَالَى: ﴿هَمَّازٍ مَّشَّآءِۭ بِنَمِيمٍ ۝١١﴾ القلم [11]

Xweda kesê ku li paş xelkê diaxive û di navbera wan de gelaciyê dike, kirêt kiriye. Ev her du taybetî, bandorên wan ên neyînî li mirov û civakê hene û ji wan bandoran:

**1. Di navbera mirovan de, dijminahî û çavreşiyê, tev dide.**

**2. ...........................................................................**

**3. ...........................................................................**

**Bihizirim û encamê jê bigirim**

Belavbûna gelacî û lidûhevaxaftinê di navbera kesên ku ji hev hez dikin de, dibe sedema jihevdûrketin û tengezariyê. Ji ber bandorên wan ên neyînî, islamê ew qedexe kirine. Ji çareyên ku mirov bi wan dikare xwe ji van her du taybetiyan xelas bike:

**1. Li xwediyên van taybetiyan guhdarî neke.**

**2. ....................................................................**

**3. ....................................................................**

**Ji waneyê fêr bibim**

**1. Di jiyana rojane de, dûrî gelecî û lidûhevaxaftinê, bikevim.**

**2. ...............................................................**

**3. ...............................................................**

**Ez ê agahiyên xwe taqî bikim**

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَلَا يَغْتَب بَّعْضُكُم بَعْضًا﴾ الحجرات [12]

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê vê ayeta pîroz de, gotûbêjê bikim û penda ku jê tê der û sûda ku jê tê girtin, di lênûsa xwe de, binivîsim.

# 4

# JI GIYANÊ XWEDA BÊ HÊVÎ NEBIN

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ يَٰبَنِيَّ ٱذۡهَبُواْ فَتَحَسَّسُواْ مِن يُوسُفَ وَأَخِيهِ وَلَا تَاْيۡـَٔسُواْ مِن رَّوۡحِ
ٱللَّهِۖ إِنَّهُۥ لَا يَاْيۡـَٔسُ مِن رَّوۡحِ ٱللَّهِ إِلَّا ٱلۡقَوۡمُ ٱلۡكَٰفِرُونَ ٨٧ ﴾ يوسف [87]

- **Ayeta pîroz handanê bi çi dike?**

## Tê bigihêjim û fêr bibim

Geşbînî: Tê wateya ku mirov bawer bike ku wê di pêşerojê de, tiştekî baş rû bide; her weha mirov bawer bike wê xêr, zora şer bibe.

## Bixwînim û encamê jê bigirim

Di jiyana mirov de, geşbînî xwedî roleke girîng e; ew jiyana mirov ber bi başiyê ve diguhêre. Ew berovajî reşbîniyê ye; a ku di hemû hêlên jiyanê de, mirov ber bi bêhêvî û binkeftinê ve dibe. Hz. Pêxember got: «Mizgîniyê bidin û nefretê nekin, hêsan bikin û asteng nekin.»

**Ji tiştên alîkar ên ku dihêlin mirov geşbîn be:**

1. **Mirov bawer bike ku her kes xwedî hin taybetî ye û ew taybetî, wî ji mirovên din cihêwaz dikin.**
2. ......................................................
3. ......................................................

## Çalakî

Gotina (dipejirînim) li rex reftarê dirust û gotina (napejirînim) li rex reftarê nedirust binivîsim û sedemê diyar bikim:

**1. Tevî ku daxwaz li ser kelûpelên bazirgan heye, ew di bazirganiya xwe de, pêşbîniya binkeftinê dike. (Napejirînim).**

**- Ji ber ku reşbînî sedema binkeftinê ye.**

**2. Cotyarê çalak çavnêriya berhemê baş dike. (                )**

**- ............................................................................**

**3. Aram tevî zehmetî û astengiyan, di xwendina xwe de, pêşbîniya serkeftinê dike. (                )**

**- ............................................................................**

**4. Ji ber ku Bêrîvan bi nexweşiyeke giran ketiye, wê dev ji dermankirinê, berdaye. (                )**

**- ............................................................................**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Geşbînî, mirov ber bi hezkirina jiyanê, berhemdariya pir û karê berdewam ve, dibe. Ev yek derfetê dide ku mirov bigihêje, pêşerojeke ronîdar. Ji bandorên geşbîniyê li mirov û civakê ev in:

**1. Bi karîneke xurt, çarekirina pirsgirêkan.**

**2. ..................................................................................**

**3. ..................................................................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Dema ku di hêlekê ji hêlan de, kêmaniyên min derkevin, ez ê ji nû ve dest bi kar bikim.**

**2. ..................................................................**

**3. ..................................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

**«Geşbîniya xêrê bike, tu dê rastî wê bê û wê bibînî.»**

Ez ê vê gotinê bi malbata xwe re gotûbêj bikim û bandorên wê li jiyana me diyar bikim.

# ZEKAT (MERC Û XURDEYÊN WÊ)

## Tê bigihêjim û fêr bibim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَأَوْحَيْنَآ إِلَيْهِمْ فِعْلَ ٱلْخَيْرَٰتِ وَإِقَامَ ٱلصَّلَوٰةِ وَإِيتَآءَ ٱلزَّكَوٰةِ﴾
الأنبياء [73]

Xwedayê payebilind got:

1. **Zekat:** (pakbûn û zêdebûn e) li gorî mercên destnîşankirî tê wateya dana parekî ji malê xwe ji bo kesê xurde.
2. **Zekat, li ser kesên ku mercên li jêr di wan de peyda dibin, erk e:**
   - **a. Gihiştîbûn:** Zekat li kesê negihiştî, nakeve.
   - **b. Hiş:** Zekat li kesê dîn nakeve.
   - **c. Islam:** Zekat li kesê ne misilman be, nakeve (ne erk e).
   - **d. Rêjeya lêketina zekatê:** Ew komepereyekî destnîşankirî ye; heke komepere kêmî wê rêjeyê be, zekat lê nakeve.
   - **e. Sal:** Divê saleke koçî di ser malê mirov re derbas bibe, heta ku bikaribe zikatê ji wî malî derxîne.

## Bixwînim û encamê jê bigirim

Mirovê xêrxwaz, her dem hewl dide ku alîkariya kesên din bike û hezkirina mirovan qezenc bike. Ev yek hevgirêdanên biratî û hevgirtênê di navbera wî û kesên din de, zêde dike:

1. **Pêwîstiyên xizan û belengazan dabîn bike.**
2. ........................................................
3. ........................................................

## Çalakî

قَالَ تَعَالَى: ﴿قَوْلٌ مَّعْرُوفٌ وَمَغْفِرَةٌ خَيْرٌ مِّن صَدَقَةٍ يَتْبَعُهَآ أَذًى وَٱللَّهُ غَنِيٌّ
حَلِيمٌ ﴿٢٦٣﴾﴾ البقرة [263]

**Li gorî ayeta pîroz, ez nimûneyên din ji sedeqeyê diyar bikim:**

**1. ..................................................**

**2. ..................................................**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Xweda jiyana me bi rêkûpêk kiriye û ji me re daye diyarkirin ku em zekat û sedeqeyên xwe bi çi awayî belav bikin. Xwedayê payebilind dibêje:

﴿إِنَّمَا ٱلصَّدَقَٰتُ لِلْفُقَرَآءِ وَٱلْمَسَٰكِينِ وَٱلْعَٰمِلِينَ عَلَيْهَا وَٱلْمُؤَلَّفَةِ قُلُوبُهُمْ
وَفِي ٱلرِّقَابِ وَٱلْغَٰرِمِينَ وَفِي سَبِيلِ ٱللَّهِ وَٱبْنِ ٱلسَّبِيلِ فَرِيضَةً مِّنَ ٱللَّهِ
وَٱللَّهُ عَلِيمٌ حَكِيمٌ ﴿٦٠﴾﴾ التوبة [60]

**Xurdeyên zekat û sedeqeyê ev in:**

**1. Xizan**

**2. Hejar**

**3. .........**

**4. .........**

**5. .........**

**6. .........**

**7. .........**

**8. .........**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Zekat, ne li komepereyan tenê dikeve.**

**2. ……………………………………...................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Di derbarê helwesteke ku tê de mirovekî alîkariya mirovekî din kiriye, ji afrîneriya xwe çêbikim û wê helwestê di lênûsa xwe de, binivîsim.

# Beşa Çarem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên pîroz ên Sûreta Israyê bi awayekî rast bixwîne û wateyên peyvên wê diyar bike.
2. Ji rêgezên nûn el-sakîna û tenwînê fêrî rêgeza (ixfaê) bibe.
3. Pendê ji koçkirina misilmanan a ber bi Hebeşeyê ve, nas bike.
4. Rewişta dilnermiyê nas bike û wê yekê di jiyana xwe de, pêk bîne.
5. Sûdên dadmendiyê bo mirov û civakê, nas bike.

# 1



# DI ÇÊTIRÎN DÎMEN DE

## Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَلَقَدۡ كَرَّمۡنَا بَنِيٓ ءَادَمَ وَحَمَلۡنَٰهُمۡ فِي ٱلۡبَرِّ وَٱلۡبَحۡرِ وَرَزَقۡنَٰهُم مِّنَ
ٱلطَّيِّبَٰتِ وَفَضَّلۡنَٰهُمۡ عَلَىٰ كَثِيرٖ مِّمَّنۡ خَلَقۡنَا تَفۡضِيلٗا ٧٠ يَوۡمَ نَدۡعُواْ كُلَّ أُنَاسِۭ
بِإِمَٰمِهِمۡۖ فَمَنۡ أُوتِيَ كِتَٰبَهُۥ بِيَمِينِهِۦ فَأُوْلَٰٓئِكَ يَقۡرَءُونَ كِتَٰبَهُمۡ وَلَا يُظۡلَمُونَ
فَتِيلٗا ٧١ وَمَن كَانَ فِي هَٰذِهِۦٓ أَعۡمَىٰ فَهُوَ فِي ٱلۡأٓخِرَةِ أَعۡمَىٰ وَأَضَلُّ سَبِيلٗا ٧٢﴾

الإسراء [72-70]

**Gotinên li jêr rast bi lêv bikim:**

{كَرَّمۡنَا} - {وَفَضَّلۡنَٰهُمۡ} - {أُنَاسِۭ بِإِمَٰمِهِمۡ} - {فَتِيلٗا}

## Çalakî

**a. Peyvan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:**

| |
|---|
| فتيلا |
| أضلّ سبيلا |
| بإمامهم |
| لا يُظلمون |

| |
|---|
| Kirêyên wan nayên kêmkirin. |
| Ew xêza milkêş a ku di qelşa kakilê de ye. |
| Kesên ku şopdariya wî, yan pirtûkên wan kirine. |
| Rêya herî dûr ji rastiyê. |

**b. Ji ayetên pîroz dijwateya peyvên li jêr derînim:**

| الخبائِث | بصير | أهنّا |
|---|---|---|
| ....... | ....... | ....... |

## Bixwînim û encamê jê bigirim

قَالَ تَعَالَى: ﴿لَقَدْ خَلَقْنَا ٱلْإِنسَٰنَ فِىٓ أَحْسَنِ تَقْوِيمٍ ٤﴾ التين [4]

Xwedayê payebilind, mirov kiriye xwedîrûmet; ew di çêtirîn dîmen de çêkiriye, karîna bilêvkirin û axaftinê daye wî, tiştên jê re pêwîst xistine rajeya wî û xweşî û rûmet dane wî.

**Ji dîmenên ku rûmetdayîna Xwedayê payebilind ji mirovan re, raber dikin:**

**1. Xweda mirov bi hiş û hizrînê cihêwaz kiriye.**

**2. .......................................................**

**3. .......................................................**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَسَخَّرَ لَكُمُ ٱلَّيْلَ وَٱلنَّهَارَ وَٱلشَّمْسَ وَٱلْقَمَرَ ۖ وَٱلنُّجُومُ مُسَخَّرَٰتٌۢ بِأَمْرِهِۦٓ ۗ إِنَّ فِى ذَٰلِكَ لَءَايَٰتٍ لِّقَوْمٍ يَعْقِلُونَ ١٢﴾ النحل [12]

Xwedayê payebilind, hemû tiştên ku di gerdûnê de hene, xistine rajeya mirov û li hember vê yekê, Xweda ew li hemberî gerdûnê û wan afrîdeyan kiriye xwedî erk.

**1. Avakirina cîhanê û parastina xêrên wê.**

**2. .......................................................**

**3. .......................................................**

**Rast bi lêv bikim û rêgeza tecwîdî, fêr bibim:**

﴿مَن كَانَ﴾ ﴿وَأَنتُم﴾ ﴿ضَآلًّا فَهَدَىٰ﴾ ﴿عِظَٰمًا فَكَسَوْنَا﴾

## Encamê jê digirim:

Ixfa, ji rêgezên nûn el-sakîna û tenwînê ye. Li gorî ziman tê wateya «nixumandinê» û weke têgeh: Ew rewşeke di navbera izhar û idxamê de ye ku bixinxin û bêlerzandin e.

**Tîpên ixfayê di destpêka gotinên li jêr de, kom bûne:**

صف ذا ثنا كم جاد شخص قد سما

دم طيباً زد في تقى ضع ظالماً

Rêgez: Heke di gotinekê yan di du gotinan de, piştî nûn el-sakîna û tenwînê, tîpeke ji her 15 tîpên ixfayê bê, ixfa pêk tê.

## Mînak:

﴿ وَأَنتُمْ ﴾**:Me li cem tîpa «ت» yê nûn el-sakîn, ixfa kir.**

﴿ ضَآلًّا فَهَدَىٰ ﴾**:Me li cem tîpa «ف» yê tenwîn, ixfa kir.**

**Di ristên li jêr de, rêgeza ixfayê, şîrove bikim:**

﴿مَن كَانَ﴾:.....................................................................

﴿ عِظَٰمًا فَكَسَوْنَا ﴾:.....................................................................

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Xweda, mirov di nav hemû afrîdeyan de, kir xwedî rûmet.**

**2. ……………………………………..................**

**3. ……………………………………..................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Bi mamosteyê xwe re, di derbarê erkê mirov di parastina gerdûnê de, gotûbêj bikim.

# KOÇKIRINA BER BI HEBEŞEYÊ VE

## Bixwînim û bersivê bidim

Piştî ku Hz. Pêxember û hevalbendên wî vegeriyan Mekayê, ji ber ku qureyşê bawer dikir ku Hz. Pêxember û hevalbendên wî li ser qezenc û desthilatdariya wan cihê metirsiyê ne, tundî û fişarên xwe li ser wan zêde kirin. Hz. Pêxember ji bo ku hevalên xwe ji ziyan û kuştinê bide alî, nîşe bi wê yekê kir ku hevalên wî ji Mekayê biçin Hebeşeyê. Hz. Pêxember (silavên Xweda lê bin) pesnê erd û padîşahê wê da û got: «Heke hûn biçin Hebeşeyê, li wir padîşahek heye; tu kes li gel wî sitembar nabe. Her weha ew erda rastiyê ye heta ku Xweda ji vê tengahiya ku hûn tê de ne, dergehekî veke.»

- **Çima Hz. Pêxember ji hevalbendên xwe xwest ku ji Mekayê derkevin?**
- **Çima Hz. Pêxember ji hevalbendên xwe re, koçberiya ber bi xaka Hebeşeyê ve, hilbijart?**

## Bixwînim û encamê jê bigirim

Hevalên Hz. Pêxember, ber bi Hebeşeyê koç bûn û bi rastî padîşahê wê (Necaşî), ew bi qencî pêşwazî kirin û li gel wî bi awayekî ewle û rûmetdar niştecih bûn. Her weha wan li wî welatî, pabendî bi toreyên jiyana rûmetdar kir û ji mêvanperweriya wan re, dilsoz bûn.

**Hevjiyana aştiyane:**

**1. Dîmeneke ji dîmenên bipêşketin û bilindbûna asta civakan e.**

**2. ........................................................................**

**3. ........................................................................**

**Bihizirim û encamê jê bigirim**

Qureyşê dev ji hevalên Hz. Pêxember berneda û bi pey wan ket heta ku çûn Hebeşeyê jî û li wir hewl da ku nêrîna padîşahê wê biguhêre û koçberan radestî wan bike. Qureyşê li pey wan, şander şandin gel padîşahê Hebeşeyê, lê wî ev yek nepejirand û li koçberan guhdarî kir. Ce`fer Bin Ebî Talib lawê apê Hz. Pêxember, bi navê hevalên xwe axivî. Wî bi pendyarî û nermî bi padîşah re gotûbêj kir û got: «Ey padîşah! Xweda ji nav me şanderk ku em binemal, destepakî û rastgotina wî dizanin, şand. Wî doza baweranîn û peristina Xweda li me kir. Me jê bawer kir û me baweriya xwe pê anî û me ew li ser tiştên ji cem Xweda anîne, şopand.»

Piştî vê gotûbêjê, padîşahê Hebeşeyê (Necaşî), li ser parastina wan rij bû.

**Ji bo ku gotûbêj sûdmend be û encamên xwe bide, divê axêver:**

**1. Pendyar be; zanibe kengî û di kîjan cihî de biaxive.**

**2. ........................................................................**

**3. ........................................................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Pendyarî, di serkeftina biryarên ku em distînin de, xwedî roleke mezin e.**

**2. ..................................................................**

**3. ..................................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Tevî ku padîşahê Hebeşeyê li ser ola xiristiyaniyê bû, lê wî hevalên Hz. Mihemed hewandin û parastina wan kir. Bi sê xêzan penda ku em ji vê yekê digirin, binivîsim.

# 3



## DILNERMÎ JI SINCÊN HERÎ BAŞ E

### Bixwînim û bersivê bidim

`Aîşayê (Xweda jê razî be) got: Hz. Pêxember ji min re got: «`Aîşa, xwedatirs û dilnerm be; her tiştê ku dilnermî derbasî wî dibe, ew tişt tê xemlandin û her tiştê ku dilnermî jê diçe, ew dibe xwedî kêmanî.»

(Muslim)

- **Hz. Pêxember di gotina xwe de, doza çi dike û çima?**

### Tê bigihêjim û fêr bibim

Dilnermî tê wateya ku mirov di gotin û kiryaran de, nerm be û tiştan bi awayê herî baş û hêsan bigire dest.

### Bixwînim û encamê jê bigirim

Ola isalmê ne tenê di navbera mirovan de, handan bi dilnermî û dilovaniyê kiriye, lê belê ev yek fireh dibe heta ku lawir û giyandarên din jî dihundirîne. Hz. Pêxember got: «Ji ber ku jinekê, pisîkek girt; xwarin û vexwarin nedayê û nehişt ew ji tiştên li erdê bixwe, ew tê işkencekirin.»

**Ji nimûneyên dilnermiya bi lawiran re:**

1. **Dana xwarin û vexwarinê.**
2. ..............................
3. ..............................

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Hz. Pêxember got: «Xweda dilnerm e û di her tiştî de, hez dilnermiyê dike.»

Xweda, dilnermî kiriye taybetiyek ji taybetiyên xwe û ji ber ku di hemû aliyên jiyanê de, sûdên wê pir in, handana me li ser dilnermiyê kiriye.

**Ji sûd û bandorên dilnermiyê li mirov û civakê:**

1. **Ferîqetbûn û vehesîna mejî.**
2. .................................
3. .................................

## Çalakî

**Di helwestên li jêr de, reftarê dilnermiyê diyar bikim:**

1. **Jîngeha min**.......................................................
2. **Mirovên bitemen**...................................................
3. **Mirovên xwedan pêwîstiyên taybet**...........................

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Dilnermî di navbera mirovan de, giyanê hezkirin û alîkariyê, xurt dike.**

**2. ……………………………………..................**

**3. ……………………………………..................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

قَالَ تَعَالَى: ﴿فَبِمَا رَحۡمَةٖ مِّنَ ٱللَّهِ لِنتَ لَهُمۡۖ وَلَوۡ كُنتَ فَظًّا غَلِيظَ ٱلۡقَلۡبِ لَٱنفَضُّواْ مِنۡ حَوۡلِكَۖ﴾ آل عمران [159]

Bi mamosteyê xwe re ayeta pîroz gotûbêj bikim û girîngiya dilnermî û dilovaniyê, diyar bikim û vê yekê di lênûsa xwe de, binivîsim.

# 4 BI DADMENDIYÊ EM BI PÊŞ DIKEVIN

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿ وَلَا يَجۡرِمَنَّكُمۡ شَنَـَٔانُ قَوۡمٍ عَلَىٰٓ أَلَّا تَعۡدِلُواْۚ ٱعۡدِلُواْ هُوَ أَقۡرَبُ لِلتَّقۡوَىٰ ﴾ المائدة [8]

- **Di ayeta pîroz de, Xwedayê payebilind, dadmendî, bi çi ve girê daye?**

## Tê bigihêjim û fêr bibim

Dema ku mirov mafê xwe çi hindik çi gelek be, bi awayekî sergihayî û nekêm bistîne, dadmendî, diyar dibe.





## Bixwînim û encamê jê bigirim

Di hemû hêlên jiyanê de, dadmendî, hîmekî girîng e. Di civakên ku dadmendî li wan serwer e, di navbera endamên wan de hevgirtin û pevgirêdan xurt dibin. Gelek teşeyên dadmendiyê hene û ji wan teşeyan:

**1. Dadmendî di navbera endamên malbatê de.**

**2. ..............................................................**

**3. ..............................................................**

## Çalakî

Gotina (dipejirînim) li rex helwesta dadmend û gotina (napejirînim) li rex helwesta nedadmend binivîsim û sedemê diyar bikim:

1. **Di ezmûnê de, ji ber ku bersiva Bêrîvanê, ji bersiva hevala wê hûrbîntir bû, mamoste pileyeke zêdetir da Bêrîvanê**
   **(Dipejirînim): Ji ber ku Bêrîvanê xwendina xwe şopandiye û gelek ked daye.**
2. **Cotyar, zekata xwe li ser kesên xizan (ji bilî kesên dewlemend) belav kiriye.**

   ..............................................................
3. **Tevî hebûna hokarên alîkar ji kesê tewanbar re jî dadwer darzandin li ser kesê tewanbar, şidand.**

   ..............................................................

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Dadmendî, taybetiyeke sincî ya pir girîng e, divê li gel mirov û civakê hebe. Bi dadmendiyê, ewlehî û jiyaneke xweş pêk tê. Ji bo kes û civakê encamên wê yên erênî hene û ji wan encaman:

**1. Mirov ferîqetbûn û ewlehiyê hest dike.**

**2. ........................................................**

**3. ........................................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Bi birayên xwe re, dadmend bim.**

**2. ........................................................**

**3. ........................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Di derbarê dadmendiyê de, ez ê helwestekê ava bikim û wê yekê bi nivîseke ku ne zêdeyî sê xêzan be, binivîsim.

# Beşa Pêncem

**Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:**

1. Ayetên pîroz ên Sûreta Beqereyê bi awayekî rast bixwîne û wateyên peyvên wê diyar bike.
2. Di peywendiya mirov a bi Xwedayê xwe re, girîngiya lavayan nas bike.
3. Girîngiya belavbûna dozê li derveyî Mekayê, nas bike.
4. Di jiyana rojane de, girîngiya birêkûpêkiya demê, nas bike.
5. Raman û nêrînên mirovên dîtir, bipejirîne.
6. Girîngiya dilsoziyê nas bike û di jiyana xwe ya rojane de, pêk bîne.

# 1



## EZ NÊZÎK IM

### Guhdarî bikim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَإِذَا سَأَلَكَ عِبَادِي عَنِّي فَإِنِّي قَرِيبٌ ۖ أُجِيبُ دَعْوَةَ الدَّاعِ إِذَا
دَعَانِ ۖ فَلْيَسْتَجِيبُوا لِي وَلْيُؤْمِنُوا بِي لَعَلَّهُمْ يَرْشُدُونَ ﴿١٨٦﴾﴾ البقرة [186]

**Gotinên li jêr rast bi lêv bikim:**

{ٱلدَّاعِ} - {دَعَانِ} - {وَلْيُؤْمِنُوا} - {لَعَلَّهُمْ}

### Çalakî

**a. Peyvan bigihînim hev û wateyên wan tê bigihêjim:**

| | |
|---|---|
| فليستجيبوا | Bila bi ya wî bikin |
| يرشدون | Bi ser rêya rast vebin |
| وَلْيُؤمِنُوا | Bila bawer bikin |

**b. Ji ayeta pîroz dijwateyên peyvên li jêr derînim:**

| بعيد | رفض | يضلّون |
|---|---|---|
| ....... | ....... | ....... |

## Bixwînim û encamê jê bigirim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَقَالَ رَبُّكُمُ ٱدۡعُونِيٓ أَسۡتَجِبۡ لَكُمۡ﴾ غافر [60]

Xweda nêzîkî peristkerên xwe ye; nêzîkbûnek ku bi meznahiya wî dikeve. Divê mirov xwe bi lavayan nêzîkî Xweda bike. Ji ber ku ji toreyên xweşik ên ku rastiya mebestê li gel Xweda nîşandan didin:

**1. Dergehê lavayan ji peristker re, vedike.**

**2. ……………………………………………………**

**3. ……………………………………………………**

## Çalakî

**Bixwînim û lihevkirinê pêk bînim:**

Ji toreyên lavayan, mirov bi Xweda re toredar be û di lavayên wan de, peyanberan weke nimûne ji xwe re bibîne. Her weha spasiya Xweda bike û bê zar nebe; piştrast be ku Xweda wê lavayên wî bipejirîne:

| Peyamber | | Lava | |
|---|---|---|---|
| **Ibrahîm (silavên Xweda lê bin)** | 2 | فَنَادَىٰ فِي ٱلظُّلُمَٰتِ أَن لَّآ إِلَٰهَ إِلَّآ أَنتَ سُبۡحَٰنَكَ إِنِّي كُنتُ مِنَ ٱلظَّٰلِمِينَ﴾ | **1** |
| **Nûh (silavên Xweda lê bin)** | … | ﴿رَبِّ ٱجۡعَلۡ هَٰذَا بَلَدًا ءَامِنٗا وَٱرۡزُقۡ أَهۡلَهُۥ مِنَ ٱلثَّمَرَٰتِ مَنۡ ءَامَنَ مِنۡهُم بِٱللَّهِ وَٱلۡيَوۡمِ ٱلۡأٓخِرِ﴾ | **2** |
| **Yûnis (silavên Xweda lê bin)** | … | ﴿رَبِّ إِنِّيٓ أَعُوذُ بِكَ أَنۡ أَسۡـَٔلَكَ مَا لَيۡسَ لِي بِهِۦ عِلۡمٞۖ وَإِلَّا تَغۡفِرۡ لِي وَتَرۡحَمۡنِيٓ أَكُن مِّنَ ٱلۡخَٰسِرِينَ﴾ | **3** |

## Bihizirim û encamê jê bigirim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَلَا تُفْسِدُوا۟ فِى ٱلْأَرْضِ بَعْدَ إِصْلَـٰحِهَا وَٱدْعُوهُ خَوْفًا وَطَمَعًا ۚ إِنَّ رَحْمَتَ ٱللَّهِ قَرِيبٌ مِّنَ ٱلْمُحْسِنِينَ ﴿٥٦﴾﴾ الأعراف[56]

**Em lavayan ji Xweda dikin:**

**1. Hezkirin ji Xweda re.**

**2. ..................................**

**3. ..................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Ez di firehî û tengahiyê de, lavayan ji Xweda dikim.**

**2. ..........................................................................................**

**3. ..........................................................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Bi mamosteyê xwe re di derbarê mijara bi lavayan re girîngiya standina bergiriyan, gotûbêj bikim û di lênûsa xwe de, binivîsim.

## 2



# BELAVKIRINA DOZÊ

### Bixwînim û bersivê bidim

Tevî astengiyên ku li hember Hz. Pêxember derketin, ew ber bi Taifê ve çû û bi mirovên wê re civiya. Wan doza wî nepejirand û ziyan gihand wî. Di sala dîtir de, di werzê Hecê de (12 sal piştî şandeyê) Hz. Pêxember bi mirovine ji Medîneya Munewer re civiya. Piştî ku wî civan ji wan stand, ew li Mekayê herêma Mûnayê, li `Eqebeyê, civiyan. Hz. Pêxember peymanek ji wan stand ku yekbûna Xweda bikin û ji tiştên ku Xweda qedexe kiriye dûr bikevin. Piştî ku Hz. Pêxember, ew peyman ji wan stand, ew bi rê ketin û navê vê peyamê, bû Peymana `Eqebeyê.

- **Li `Eqebeyê, Hz. Pêxember ji şandeya Medîneyê soza çi stand?**

### Tê bigihêjim û fêr bibim

Di Peymana `Eqebeyê de, hin bend hebûn, kesên ku ew peyman bi Hz. Pêxember re, girêbest kir, tê de lûtkeya sinc, xêr û pendeyariyê dît. Wan bi Hz. Pêxember re, peyman li ser:

Tu hevparan ji Xweda re çênekin, diziyê nekin, zarokên xwe nekujin, bi lebatên xwe tu gunehan nekin û di tiştên qenc de, gunehan nekin.

## Bixwînim û encamê jê bigirim

| Rista Quranî | Nirxê ku nîşan dike |
|---|---|
| ﴿وَلَا تَقْتُلُوٓاْ أَوْلَٰدَكُمْ خَشْيَةَ إِمْلَٰقٖۖ نَّحْنُ نَرْزُقُهُمْ وَإِيَّاكُمْۚ إِنَّ قَتْلَهُمْ كَانَ خِطْـٔٗا كَبِيرٗا﴾ | Mafê jiyanê |
| ﴿فَٱعْلَمْ أَنَّهُۥ لَآ إِلَٰهَ إِلَّا ٱللَّهُ﴾ | ................................ |
| ﴿ٱنظُرْ كَيْفَ يَفْتَرُونَ عَلَى ٱللَّهِ ٱلْكَذِبَ﴾ | ................................ |

## Fêr bibim û bersivê bidim

Di sala 13`an a şandeyê de, ji nû ve şandeya Medîneyê li `Eqebeyê bi Hz. Pêxember re, civiya. Ew şande, nêzî 70`ê kesî bû û navê wê peymanê bû Peymana `Eqebeya Duyem. Di wê peymanê de, ji hêla mirovên Medîneyê ve, soz hat dayîn ku dema Hz. Pêxember biçe gel wan, parastina wî bikin. Her weha Hz. Pêxember, ji bo ku mirovên Medîneyê fêrî ola xwe bibin, Mus`eb Bin `Umeyr bi wan re, rê kir.

- **Soza mirovên Medîneyê ji Hz. Pêxember re, diyar bikim.**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Pabendiya mirovên Medîneyê ya bi peymanê, nîşana rastiya niyaza wan û hezkirina wan a ji xêrê re ye.**

**2. ........................................................................................................**

**3. ........................................................................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Hz. Pêxember got: «Ez ji bo sergihayîkirina sincên herî baş hatime şandin.»

Bi hevalên xwe re, gotina Hz. Pêxember, gotûbêj bikim û tiştê ku di waneyê de, pê re li hev tê, destnîşan bikim û vê yekê di lênûsa xwe binivîsim.

# 3



## BIRÊVEBIRINA DEMÊ

### Bixwînim û bersivê bidim

Ibnû `Ebas (Xweda jê razî be) got: Hz. Pêxember got: Pênnc tiştan qezenc bike; xortaniya xwe beriya pîrbûnê, tendirustiya xwe beriya nexweşiyê, dewlemendiya xwe beriya xizaniyê, valahiya xwe beriya mijûlbûnê û jiyana xwe beriya mirinê.

(Hakim)

- **Li gorî gotinên Hz. Mihemed; wî handana me li ser çi kiriye?**

### Bixwînim û encamê jê bigirim

Islam, demê weke xweşiyeke celîl dibîne. Ji ber ku gava dem derbas dibe, ew venagere û mirov nema digihêje wê. Divê ew bê hûde, neyê xerckirin û bi awayekî xweşik bê keysbazkirin; pêwîst e her mirov wê bi rengê herî xweşik berhênan bike.

**1. Tiştê herî buha yê di destê mirov de ye.**

**2. ……………………………………………………………**

**3. ……………………………………………………………**

## Tê bigihêjim û fêr bibim

Birêvebirina demê: Ji bo ku mirov xwe bigihîne armancên destnîşankirî, bi rengê herî nimûneyî demê, karînên kesayetî û tiştên berdest, keysbaz bike.

## Çalakî

Dem sparte ye; divê mirov wê bê hûde xerc neke û bi tiştên ku qezencekê li mirov bikin, keysbaz bike.

**Ji nimûneyên birêvebirina demê:**

**1. Xwendina pirtûkên bisûd.**

**2. ....................................**

**3. ....................................**

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Birêvebirina demê, behremendiyek e; kesê ku girîngiya demê û nirxên wê dizane, dikare wê pêk bîne. Civaka ku endamên xwe ber bi rêxistkirina demê ve dibe, dikare rabe û bi pêş bikeve.

**Ji sûdên birêvebirina demê ji bo mirov û civakê:**

**1. Serkeftina di xwendinê de.**

**2. ...........................................**

**3. ...........................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Bi awayekî berdewam demê bi rêk û pêk bikim.**
**2. ..............................................................................**
**3. ..............................................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

«Dem zêr e, here pê re»
Vê penda li jor bi hevalên xwe re gotûbêj bikim û ziyanên bipaşxistina kirina tiştan di pêkanîna armancan de, diyar bikim û di lênûsa xwe de binivîsim.

# RÊZGIRTINA NÊRÎNÊN DIN

## Bixwînim û bersivê bidim

قَالَ تَعَالَى: ﴿وَلَوْ شَآءَ رَبُّكَ لَجَعَلَ ٱلنَّاسَ أُمَّةً وَٰحِدَةً ۖ وَلَا يَزَالُونَ مُخْتَلِفِينَ ۝١١٨ إِلَّا مَن
رَّحِمَ رَبُّكَ ۚ وَلِذَٰلِكَ خَلَقَهُمْ﴾ هود [118، 119]

- **Wateya ayeta pîroz bi kurtî diyar bikim:**

## Tê bigihêjim û fêr bibim

Di hizirîn, raberkirin û tiştên din de, ji her mirovekî re rêbazekî cuda heye. Cudabûna di navbera mirovan de, nayê wateya nakokî û pevçûnê. Ew tê wateya, hevnaskirin, gotûbêj û avakirina civakeke mirovane û hevgirtî.

## Bixwînim û encamê jê bigirim

Di navbera endamên civakê de rêzgirtina nêrîn, bawerî, dadmendî û ewlehiyê pêk tîne.

| Ji nimûneyên rêzgirtina nêrînan |
|---|
| Rêzgirtina ji olên din re. |
| ............................... |
| ............................... |

## Çalakî

**Di cihên li jêr de, reftarên xwe yê di derbarê rêzgirtina nêrînên kesê din de, diyar bikim:**

Mal: ............................................................

Dibistan: ........................................................

Bajar/gund: .....................................................

## Bixwînim û encamê jê bigirim

Di hemû warên jiyanê de, ji bo çarekirina pirsgirêkên ku li hember mirov derdikevin, rêzgirtina nêrînan cihêwazî, afrînerî û lezê dixe warê çarekirinê de.

Ev yek dihêle pêşketin û pêşveçûn di wî warî de çêbibin. Gelek sûdên rêzgirtina nêrînan hene:

**1. Mirov ji serbûrî û şarezaya kesên din sûdê digire.**

**2. ..........................................................**

**3. ..........................................................**

## Ji waneyê fêr bibim

**1. Ku nêrîna hevalê min ji ya min cuda be jî ez ê rêzê jê re bigirim.**

**2. ..........................................................................................**

**3. ..........................................................................................**

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Di derbarê rêzgirtina nêrîneke destnîşankirî de, ez ê helwesteke ku ne zêdeyî sê xêzan be ji afrîneriya xwe ava bikim û di lênûsa xwe de, binivîsim.

# 5 BI DILSOZIYÊ EM BILIND DIBIN

## Bixwînim û bersivê bidim

H. Pêxember got: «Kar bi niyazan e û her mirov li gorî niyaza wî jê re tê.»

- **Li gorî gotina Hz. Pêxember dilsozî di çi de xuya dibe?**

## Tê bigihêjim û fêr bibim

Dilsoziya niyazê: Tê wateya ku mirov di armancên xwe de, rast û zelal be û di kîjan karî de be jî ji bo ku kar sergîhayî bibe, xwe biwestîne.

## Bihizirim û encamê jê bigirim

Di hemû karên ku mirov pê radibe de, dilsozî derfetê dide ku mirov şareza be û di kirina qenciyê de, beza be.
Mînak: Xwendekar di xwendina xwe de cihêwaz be. Karmend di erka xwe de şareza be, doktor ..................
Ev yek dihêle ku serkeftin û pêşketin çêbibin û ji bo xurtkirina vî nirxî, divê mirov xwedî hin taybetî be û ji wan taybetiyan:

1. Di hemû warên jiyanî de, dilnizim be.
2. ……………………………..........
3. ……………………………..........

## Çalakî

**Çawa di xalên li jêr de dilsoz bim:**

1. Bi hevalên xwe re.
2. Di xwendina xwe de.
3. Li hember welatê xwe.

## Ji waneyê fêr bibim

Dilsozî, karê dilpaqijan e. Pakbûna derûniyê, mirov ber bi kirina karê qenc û tê de berdewambûnê ve, dibe û ji kirina karê nebaş, dûr dixe.

Divê ez dilsoz bim di:

1. Têkiliya min a bi malbata mim re.
2. …………………………………..........
3. …………………………………..........

## Ez ê agahiyên xwe taqî bikim

Ez ê bi hevalên xwe re, derbarê mijara encamên dilsoziyê ji bo mirov û civakê, gotûbêjê bikim û di lênûsa xwe de binivîsim.

